

BERNAME

# Perwerdehiya bêsînor

Dibistana Bilind a Xebatên Civakî û Tenduristiyê ya Lozanê

HE TSL

Hes·so
Haute Ecole Spécialisée de Suisse occidentale

# ŞERT Û MERCÊN JI BO BERNAMEYA PERWERDEHÎ YA BÊ SÎNOR

Bername ji bo penaberan e (kesên xwedî nasneme ya N, F, B-penaber, C-penaber)

## Xwendevanên guhdêr

- Ev bername ji bo her niv saliya perwerdehiyê ji du modulan pêk tê. Kesên penaber bi statuya guhdêr beşdarê vê bernameyê dibin.
- Beşdarvanên ku di azmûnan de biserketin wê bibin xwediyê krediyên ECTS (Pergala Veguheztina Krediyê ya Ewropî) û ew dikarin van krediyan pîştre ji bo zanîngehê bikar bînin.
- Xwendevanên dibistanê dê ji bo xwendevanên guhdêr şêwirmendî bikin û bibin alîkar.

### Şert

- Divê beşdarvan bikaribe qursên bi fransî bişopîne, di polê de beşdarî nîqaşan bibe û xwedî bingehek akademîk be da ku bikaribe perwerdehiyek asta Zanîngehê bişopîne.
- Dîplom ango pileyekî pêşîn hewce nake.

### Belgeyên ku bên şandin

CV û nameya motîvasyonê

### Plansaziya bernamê

- Di payizê de bi dibistanê re bikevin tekîliyê.
- Di meha qanûnê de qeydên xwe yên ji bo du modulên ku di biharê de destpê dike, çê bikin

## Xwendekarê Zanîngehê

Ev beşa bernameyê ji piştgiriya di warê amadekirina belgeyên ji bo qeyda zanîngehê ya li HETSLê (Dibistana Bilind a Xebatên Civakî û Tenduristiyê ya Lozanê) pêk tê.

### Şert

- Divê ev kes di bernameya xwendevanê guhdêr de cîh girtîbin
- Divê ev kes van pîvanan bi cîh bînin :
  - Xwedî dîploma lîseyê an jî dîplomekî di heman astê de be
  - Xwedî sertîfîkaya zimanê fransî ya asta B2 ya PELê (Portfolioya Zimanên Ewropî) be an jî xwedî sertifikayekî di heman astê de be.
  - 800 saetê wî (20 hefte) di qadên civakî de, bi giştî 1600 saet (40 hefte) di karekî de xebitîbe.
  - Di hin rewşan de azmûnên ECUSê (Ezmûna Pêvek a Zanîngehên Swîsreyê) jî tê xwestin

### Plansaziya bernameyê

1. Berê destpêka sala akademîk ya li HETSLê (ango 18 meh beriya destpêka sala akademîk ya di meha Îlonê de), bi rêveberê/a bernameyê re bikevin têkiliyê.
2. Roja dawîn ya ji bo qeydirinê: 31 rêbendan
3. Qedandina serpêhatiya di qada civakî û erê kirina vê serpêhatiyê: 31 Gulan
4. Qedandina serpêhatiya di beşekî din de û erê kirina vê serpêhatiyê: 30 Pûşber

### Belgeyên ku bên şandin

- CV û nameya motîvasyonê
- Dîplom û sertîfîka

## Hevkar / Rê û Rêzan

- Hevkarî bi EVAM, CSIR û Xizmeta Civakî ya Lozanê (SSL) ji bo ku beşdarvan bên diyarkirin û hilbijartin

## Serpêhatiyên beşdarvanan

*"Di van qursên li HETSLê de, min hevalên xwe yên polê nas kir. Me gelek kar bi hev re kir, û vê yekê rê da me ku em bi hev re têkilî daynin û pevguhertina ramanên xwe bimeşînin. Şagirt dilgiran û têgihîştî bûn. Bi rastî, min baş bi fransî nizanibû û wan alîkariya min kir ku fêm bikim û wan piştgiriyeke bi baş da min. »*

***Xwendevana guhdêr ya sala 2019, ji Etiyopyayê***

*"Tecrûbeya min a li vê dibistanê ji min re bû alîkar da ku ez bikaribim perwerdehiya pîşeyî ya ku dixwazim bişopînim,hilbijêrim. Ev hilbijartin li gorî bingeha tecrûbeyên min ên pîşeyî yên beriya hatina min a Swîsreyê û asta min a zimanê fransî bû. »*

***Xwendevana guhdêr ya sala 2019, ji Etiyopyayê***

*« Mamoste pir başin» « … ji bo min ev serpêhatiyeke pir girîng e û tu car nayê ji bîr kirin. Ez gelek tişt jê hîm bûm. »*

***Xwendevana guhdêr ya sala 2017***

*"Xwedîbûna statûya xwendekar li HETSLê ji bo nîv saliya perwerdehiyê alîkariya min kir ku hesta min a girêdayî dibistanê xurt bike (mînak, ji ber hebûna qerta xwendekar min hîs kir ku ez endamê civata HETSL me). Ji ber vê yekê min karî bi naskirina xwendekar û mamosteyan tora xwe ya şexsî û pîşeyî pêş bixim. »*

***Anonîm***

## Têkîlî

**Ruxandra Oana Ciobanu**
Li HESê mamoste
Chemin des Abeilles 14
1010 Lausanne · Suisse
oana.ciobanu@hetsl.ch
www.hetsl.ch